Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :402 nameronahi@gmail.com 28- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Cotkar bi fikarin ku erdên wan bişewitînin



Artêşa tirk a dagirker ev bûye du sal li pêşiya cotkarên gundên nêzî sînor dibe asteng ku erdên xwe bê xem biçînin. Metirsiya cotkaran heye ku erdên wan mîna par bişewitînin.

Dewleta tirk a dagirker ji destpêka aloziya Sûriyê ve bi gelek rê û rêbazan destwerdana Sûriyê dike û dibe sedema kûrkirina aloziya Sûriyê. Yek ji wan rêbazan jî kiryarên wê yên li ser sînor in. Gundên li ser sînor ji derveyî çandiniyê tu çavkaniya wan a jiyanê nîn e û artêşa tirk a dagirker ev bûye çend sal destûr nade cotkaran ku nêzî erdên xwe bibin û wan gulebaran dike. Di encama gulebarankirina wan a cotkaran de gelek cotkaran jiyana xwe ji dest da yan jî birîndar bûn.

Dewleta tirk a dagirker sala 2015`an li ser sînorê di navbera Sûriye û Tirkiyê de dîwarê şermê bi dirêjahiya 781 km lê kir. Ew dîwarê şermê 3 m bilind e û hatiye têlkirin. Her wiha li ser dîwarê şermê kamera, çekên giran û lazer bi cih kirine û balafirên keşfê jî hene. Niha jî dewleta tirk a dagirker li ser sînor navendên bilind lê kirine û kîjan welatî nêzî sînor dibe wan gulebaran dike.

Gundê Eyndîwer dikeve bakurê rojhilatê Sûriyê û li beramberî bakurê Kurdistanê ye. Cotkarên vî gundî nikarin nêzî erdên xwe bibin û ev bûye du sal ku ji cotkarên gund kesek nikare erdê xwe biçîne. Gundê Eyndîwer jî yek ji çavkaniya sebzeyên herêma Dêrikê ye.

Erdê ku nêzî ava Dîcle ye, cotkar heyanî 50 hektarî nikarin nêzî wî erdî bibin. Berê li wî erdî sebze dihatin çandin û ew sebze li bazarên herêmên bakurê Sûriyeyê dihatin firotin. Her wiha li wî erdî genim û ceh jî dihat çandin. Cotkarên gundê Eyndîwer îsal jî nikarin wî erdî biçînin.



Ji cotkarên gundê Eyndîwer Abdullah Xelîl wiha got: "Tirk gundê me gulebaran dikin. Gundê me xwe li ser sewalkarî û çandiniyê xwedî dike, tirk nema destûr didin em nêzî erdên xwe bibin. Par jî leşkerên tirk destûr neda ku cotkar sûd ji erdên xwe wergirin û ceh û genimê her kesî şewitandin, îsal jî kîjan cotkar nêzî erdê xwe bibe wî gulebaran dikin."

Xelîl di dawiya gotinên xwe de bang li rêxistinên navneteweyî kir ku li hemberî kiryarên Tirkiyeyê bê deng nemînin.

Her wiha Cewad Elî jî axivî û ev tişt anîn ziman: "Leşkerên tirk gelek caran welatiyên gundê me gulebaran kirin û ew birîndar kirin, ev bûye du sal jî destûr nadin ku kesek ji cotkarên me biçin erdê xwe biçînin."

Elî di berdewama gotinên xwe de got ku ew îro jî ji aliyê leşkerên tirk ve hatine gulebarankirin û wiha got: "Îro dema ku em diçûn nava erdê xwe leşkerên tirk em dîsa gulebaran kirin û me nikaribû em bixebitin. Em mecbûr man ku dev ji erdê xwe berdin û ditirsin ku leşkerên tirk mîna par erdên me bişewitînin."...**ANHA**

# Çiyayên Omeryan bi keskahiyê xemilî



Sala borî di mehên havînê de di navbera mehekê de çiyayên Omeryan du caran hatin şewitandin û îsal tevî hemû tiştî bi keskahiyê xemilî.

Her sal ji ber polîtîkayên şer xwezaya Kurdistanê tê şewitandin û tunekirin. Ji salên 90'î heta niha bi sedan carî xweza hatiye şewitandin û tevî van hemû pêkutiyan bi nûbûna xwe berxwedana xwe nîşan dide. Wek çiyayên Omeryan ya li Nisêbîna Mêrdînê. Sala borî bi sedan hektar qad hat şewitandin û niha herêma Omeryan ji nû ve kesk bû.

Salek berê li herêma ku gund lê ye, tevî ku qedexe tune bû jî bi hinceta 'pevçûn hene' bi balafiran bombebaran pêk hat. Li çiyayê ku ji 3'an zêdetir qerekol lê ne di encama bombebaranê de şewat derket û hefteyekê çiya şewitîn. Leşkeran nehişt gel jî şewatê bitemirîne û hefteyekê şewat hat temaşekirin.

Şewata yekem li alî Akarsu derket û bi dehan hektar qad şewitî û di wê navberê de kesekî jiyana xwe ji dest da û bi sedan dar tune bûn. Piştî şewat hat temirandin şûnde aliyê çiya yê saxlem mabû jî hat bombebarankirin û çiya hatin texrîbkirin...**JINNEWS**

# Perwerdeyên QSD`ê dewam dikin



QSD ji bo bêşvebirin û tekûzkirina şervanên xwe, perwerdeyên xwe didomîne.

Bi vê armancê li Akademiya Şehîd Nûr Gemro û Akademiya Şehîd Feyad El-Şiblî perwerdeyên nû dan destpêkirin.

Bi beşdariya gelek fermandarên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê li Akademiya Şehîd Ezîz Ereb ji 50 fermandaran re perwerdeyek da destpêkirin. Dewreya perwerdeyê bi navê Şehîd Nûr Gemro dest pê kir û armanc ji vê dewreyê ew e ku fermandar ji gelek hêlan ve werin xurtkirin.

Perwerde wê 2 mehan dewam bike û di nav de wê waneyên bîrdozî û leşkerî bên dayîn.

Her wiha Akademiya Şehîd Feyad El-Şiblî bi tevlêbûna 25 endaman dewreyeke perwerdeyê bi navê Şehîd Silûga da destpêkirin. Perwerde wê meh û nîvekê berdewam bike. Di perwerdeyê de waneyên rêbazên vekirina mayinan wê bên dayîn.

Di merasîma vekirina her du perwerdeyan de şervan û fermandarên ku wê tev li perwerdeyê bibin li qada Akademiya Şehîd Ezîz Ereb li hev kom bûn û bi dehan şervan û mêvan jî amade bûn...**ANHA**

# Li Reqayê kanalîzasyon tên sererastkirin



Şaredariya Gel a Reqayê dest bi sererastkirina xetên kanalîzasyona bajêr ku ji ber şerên li herêmê zirar dîtiye, kir.

Komîteya Xizmetguzariyê ya bajarê Reqayê bi hevkariya rêxistina BIOMANT dest bi xebatên sererastkirina xetên kanalîzasyona taxên bajêr kir.

Piştî şaredariyê xebatên sererastkirina xeta kanalîzasyonê ya sereke ya kolana El-Mensûra li ber mûzeyê bi dawî kir, dest bi sererastkirina xetên kanalîzasyona taxa El-Mişlib li ber navenda bijîşkên bê sînor kir.

Dirêjahiya xeta kanalîzasyona taxa El-Mişlib hezar û 550 m ye û firehiya boriyên xetê 40-50 mm ne.

Hevserokê Şaredariya Gel a Reqayê Ehmed Ibrahîm diyar kir ku şaredarî bi koordîneya komîteya ji nûveavakirinê dê xebatên sererastkirinê bidomîne...**ANHA**

Ronahî
nameronahi@gmail.com Hejmar : 402 28 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Hemû herêm wê ji çeteyan bê rizgarkirin



Qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bi hemû leza xwe didome. Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdullah diyar kir ku şervanên QSD'ê hemû gundewarên bajarê Hesekê ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar kirin. Lîlwa destnîşan kir ku şervanên QSD`ê bi hevkariya artêşa Iraqê wê hemû herêmê ji çeteyan rizgar bikin.*R-3*

# ÇETE NIKARIN JI XEZEBA ZEYTÛNÊ BIREVIN




## 20 ÇETE HATIN KUŞTIN

Li navenda Efrînê leşker û çeteyên dagirker derbên giran dixwin û her roj windahiyan didin. Li navenda Efrînê li nuqteyên çeteyan sê teqînên dijwar rû dan. Hat ragihandin ku di van teqînan de herî kêm 20 dagirker hatine kuştin û gelek ji wan jî birîndar bûne. Piştî teqînan hat gotin ku dagirker di nava Efrînê de seferbûne û hemû riyên bajar girtine.

## TIRS KETIYE DILÊ DAGIRKERAN

Li Efrînê Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ku beriya niha bi demekê hat ragihandin, li dijî leşker û çeteyên dagirker çalaliyên bi bandor dike. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ragihand ku êvara 25'ê Hezîranê li navçeya Mabata ya Efrînê li dijî çeteyan çalakî hatiye kirin. Di çalakiyê de çeteyek hatiye kuştin û serçeteyek jî birîndar buye. *R-2*

## Çalakiya 'Mertalên Zindî' didome



Çalakiya 'Mertalên Zindî' ya ciwanên Başûrî ya li Qendîlê ku li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk dest pê kir, 20 roj in dewam dike. Şêniyên herêma Meredo ya Qendîlê duh çûn serdana çalakgerên Mertalên Zindî. Bi navê çalakgerên 'Mertalên Zindî' Wîlyen Berzencî destnîşan kir ku êrîşên li dijî Qendîlê li dijî tevahiya destketiyên Kurdistanê ye. *R-5*

## Armanc dagirkirina tevahiya Başûr e

Berpirsê Komîteya pêşmergeyên Dêrîn beşê girtiyên siyasî yê YNK'ê Mam Hejar derbarê êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê de axivî û diyar kir armanca dewleta Tirk dagirkirina tevahî Başûre û wiha got, "li Başûrê Kurdistanê dijî dagirkeriya tirk tifaqek nîne. Ji ber berjewendiyên hizbî yên li gel dagirkeran, rê nade em yekîtiya netewî ava bikin." *R-4*

## Em ê li dijî dagirkeriyê bisekinin

Dewleta Tirk a ku bi salan e di bin navê PKK'ê de êrîşî xaka Başûrê Kurdistanê dike. Heta niha di encama êrîşan de bi dehan welatiyên başûr şehîd bûne. Welatiyên başûr diyar kirin ku li dijî êrîşan ew ê cih û warê xwe neterikînin û bang li hêzên Kurd kirin ku li dijî êrîşên dagirkeriyê bibin yek." *R-5*

## Heyeta jinên Rojava li Başûr e



Şandeya Kongreya Star di çarçoveya Pêngava "Jinên cîhanê ji bo Efrînê serî hildin" serdana sazî û buroyên jinan ên Başûrê Kurdistanê dike. Di nîqaşan de, behsa girîngiya destwerdana rêxistinên jinan, hiqûqî û siyasî ji bo rawestandina binpêkirinên derbarê jinan bi taybetî jinên Efrînê hate kirin. *R-3*

## Kongreya Star hêviya jinan e






Kongreya Star ji bo perwerdekirin û çareserkirina pirsgirêkên jinan xwedî roleke girîng e. Jinên Bakurê Sûriyê Kongreya Star ji bo xwe weke hêviyekê dibînin. Jinên Taxa Şêxmeqsûd a Helebê diyar kirin ku jinên xwe bi rêxistin kirine dikarin hemû pirsgirêkên xwe çareser bikin. *R-3*

## Heta azadiyê wê têkoşîn bidome




Çalakiya li bajarê Fransa Strasbourgê ya ji bo azadiya rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dike. Parlementerê berê yê HDP'ê Ertûgrûl Kurkçu, parlementerê YNK'ê Salar Mehmûd, parlementerê Goran Şêrko Emîn piştgirî dan çalakiyê. Hevserokê Kongra-Gel Remzî Kartal di çalakiyê de axivî û diyar kir ku heta Azadiya Ocalan wê ev çalakî berdewam bikin. *R-4*

## Li Îranê çalakiyên bazirganan dewam dikin



Çalakiyên bazirganên Îranê li Tehranê û gelek bajaran tevî hemû astengiyan dewam dikin. Bazirganên Tehranê, ji bo şermezarkirina ne arambûna rewşa gumrukê û astengkirina malên wan, roja Yekşemê daketin qadan û dest bi çalakiyan kirin. Hate ragihandin ku hêzên rejîma Îranê bi gazên îsotê û fîşekên plastîk dest li çalakiyan werdane û gelek çalakger destgîr kirine. *R-2*

## 200 kes li Nîjeryayê hatin kuştin



Li Nîjeryayê di navbera sewalkarên koma etnîkî ya Poller a Misilman û cotkarên Xiristiyan de şerekî dijwar diqewime. Şer li eyaleta Plateaûyê dawiya hefteyê qewimî. Waliyê eyaletê Sîmon Lalong got, "di nava du hefteyan de zêdeyî 200 kes mirine." *R-2*

## YE'ê daxwaza Tirkiyê red kir

Di civîna Konseya Karên Giştî ku bi tevlêbûna Wezîrên Karên Derve û Wezîrên YE li Luksemburgê pêk hat de, daxwaza Tirkiye ku sînorên Yekîtiya Gumrikê bê firehkirin hat redkirin. YE diyar kir ku Tirkiye ji nirx û pîvanên YE'ê dûr dikeve û edalet, azadiya îfade û çapemeniyê mînak nîşan da. *R-2*

## Vegerî Efrînê lê poşman bû



Piştî ku dewleta Tirk Efrîn dagir kir êdî welatî newêrin vegerin Efrînê. Welatiyên Efrînê yên ku berê koçî Tirkiyê kirine jî, bi propagandaya derew a ku li Efrînê aramî heye û wan dixapînin da ku ew vegerin Efrînê. Welatiyê Cindirê Fayîq Îbrahîm ku pişt 5 salan vegeriya Efrînê ji aliyê çeteyan de hat girtin û êşkencekirin. *R-4*

## Em ê Efrînê ji dagirkeran rizgar bikin



Piştî ku Konferansa Rizgarkirina Efrînê hat lidarxistin û seferberiya giştî hat ragihandin, delegeyên konferansê li ser encamên konferansê civînan ji gelê Efrînê yê li Şehbayê re lidardixin. Di civînan de encam û biryarên konferansê tên nirxandin. Welatiyên Efrînê jî diyar kirin ku ew amade ne tevlî serferberiyê bibin û Efrînê rizgar bikin. *R-6*

## Ji bo Yekîtiya Neteweyî deriyên nû vebû




Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier ku ji nû ve bû parlamenterê HDP'ê diyar kir ku di hilbijartinan de piştevaniya partiyên kurd a ji bo HDP'ê di warê Yekîtiya Neteweyî ya Kurd de gavek pêşketî bû û wê HDP ji bo pêkanîna Yekîtiya Neteweyî ya Kurd xebatên xwe dewam bike. *R-4*

## Li Gever û Bedlîsê 9 leşker hatin kuştin



Şer û pevçûnên di navber gerîlayên Kurdistanê û artêşa Tirk ya dagirker de berdewam dike. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li Geverê 8 leşkerên Tirk hatine kuştin. Li gorî daxuyaniya HPG'ê, li Bedlîsê jî leşkerek hate kuştin. *R-2*

# Li Efrînê 20 çete hatin kuştin

***Li navenda Efrînê leşker û çeteyên dagirker derbên giran dixwin û her roj windahiyan didin. Li navenda Efrînê li nuqteyên çeteyan sê teqînên dijwar rû dan. Hat ragihandin ku di van teqînan de herî kêm 20 dagirker hatine kuştin û gelek ji wan jî birîndar bûne. Piştî teqînan hat gotin ku dagirker di nava Efrînê de seferbûne û hemû riyên bajar girtine.***



Li navenda Efrînê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin, li nuqteyeke çeteyan 2 teqînên dijwar rû dan. Teqînek jî li nêzî Nexweşxaneya Dersimê bû. Tê gotin ku ji ber teqînê gelek kes mirine û birîndar bûne.
Li gorî agahiyên ku çavkaniyekî li nava bajêr ragihand, teqîn roja Çarşemê saet 12:35'an rû dan. Çavkaniyekî bi navê H.A. ragihand ku herdu teqîn li nuqteyeke çeteyên eniya El Şamiye rû dane ku li nêzî çerxerêya Kawayê Hesinkar ê li navenda bajêr e.
Tê gotin ku teqîn bi wesayitên bombebarkirî hatine kirin û gelek kes mirine û birîndar bûne. Lê belê li ser mijarê agahiyeke berfireh bi dest neket. Hin çavkanî dibêjin, teqînan rê li ber xisareke mezin a madî jî vekirine.
Demeke kin piştî herdu teqînan, vê carê li kolana Feylakê dengê teqînê hat. Ji ber teqîna li nêzî Nexweşxaneya Dersimê, herî kêm 20 çete mirin.
Dagirker niha li Efrînê seferber bûne û hemû rêyên bajêr girtine. Nayê zanîn bê teqîn ji aliyê kê ve hatiye kirin.
Dewleta Tirk tevî çeteyên xwe bi rêk û pêk li herêmê sûcên şer dike. Hêzên Tirk roja 20'ê Çileyê dest bi êrîşên dagirkeriyê kirin. 18'ê Adarê jî tevlî çeteyên xwe ketin nava navenda bajêr. Ji dema destpêkirina êrîşên dagirkeriyê û vir ve bi sedan sivîl hatin kuştin, bi sedan kes jî hatin revandin. Her wiha mal û milkên Kurdan hatin talankirin.

## Tirs ketiye dilê çeteyan



Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ku beriya niha bi demekê li Efrînê hate ragihandin, li dijî çeteyan çalakiyan dike. Herî dawî çeteyek hate kuştin, yek jî birîndar bû.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ragihand, êvara 25'ê Hezîranê li cihekî navbera gundên Amara û Şêxutka yên li navçeya Mabata ya Efrînê li dijî çeteyên dewleta Tirk a dagirker çalakî hatiye kirin.
Li gorî agahiyan, di çalakiyê de çeteyek hatiye kuştin, serçeteyê bi navê Derzî Ebû Xalid jî birîndar bûye.
Fermandariya Odeya Operasyonê ya Xezeba Zeytûnê daxuyanî da û got, "Artêşa Tirk a dagirker, çeteyên wê û xayinên bi wan re dixebitin ku Efrîn dagir kirine û zilmê li gelê me dikin, wê di hedefa me de bin."
Di dewama daxuaniya fermandariyê de hate gotin, "Çalakiyên me wê bi berfirehî bidomin û weke Odeya Çalakiyan em ê çalakiyên xwe ji niha û pê ve xurtir bikin."
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê, çalakiya xwe ya destpêkê 9'ê Hezîranê kiribû. Di vê çalakiyê de serçeteyê koma bi navê El-Cebha El-Şamiya Ehmed Misto (Ebû Eslan El-Kurdî) hatibû kuştin.

## 200 kes li Nîjeryayê hatin kuştin



Li Nîjeryayê di navbera sewalkarên koma etnîkî ya Poller a Misilman û cotkarên Xiristiyan de şerekî dijwar diqewime. Dawiya hefteyê zêdeyî 200 kes mirin.
Şer li eyaleta Plateaûyê dawiya hefteyê qewimî. Waliyê eyaletê Sîmon Lalong got, "di nava du hefteyan de zêdeyî 200 kes mirine. Beriya niha hatibû gotin ku 86 kes mirine."
Walî Lalong diyar kir, zêdeyî 200 kes ji aliyê kesên ji koma etnîkî ya Poller ve hatine kuştin. Koma etnîkî ya Poller jî sûcdariyan qebûl nake.
Ji destpêka salê û vir ve li eyaleta Plateaûyê, bi sedan kes ji ber şerê navbera komên etnîkî jiyana xwe ji dest dane.
Li Nîjeryayê ku nifûsa xwe 180 milyon e, şerê li ser zeviyan êdî di asta dînî, siyasî û etnîkî de tê kirin.

## YE'ê daxwaza Tirkiyê red kir

Yekîtiya Ewropa (YE), daxwaza Tirkiyê ya ku yekîtiya gumrikê fireh bike qebûl nekir û daxwaza Tirkiye red kir. YE diyar kir ku Tirkiye ji nirx û pîvanên YE'ê dûr dikeve û edalet, azadiya îfade û çapemeniyê mînak nîşan da.
Yekîtiya Ewropa (YE) daxwaza Tirkiyê ya ku sînorê Yekîtiya Gumrikê fireh bike red kir. Li gorî nûçeya Deutsche Welle ya tirkî civîna Şeva Sêşemê ya Konseya Karên Giştî ku bi tevlêbûna Wezîrên Karên Derve û Wezîrên YE li Luksemburgê pêk hat, daxwaza Tirkiye ku sînorên Yekîtiya Gumrikê bê firehkirin hat redkirin.
YE'yê di sedema redkirinê de diyar kir ku azadiya raman û îfadeyê û azadiya çapemeniye hatiye îhlalkirin û edalet hatiye sînorkirin.
Seroka Almanya Angela Merkel çend meh berê daxuyanî dabû û diyar kiribû ku ne pêkan e ku sînorê yekîtiya gumrikê li Tirkiye bê firehkirin û ne pêkan e Tirkiye têkeve YE'ê.

### BILA BI DAWÎ BIBE

Di civînê de Avusturya xwest têkiliyên di navbera Tirkiyeyê û YE'ê de bi awayekî fermî bi dawî bibe. Pêvajoya Tirkiye ya bi YE'ê re di sala 2005'an de bi awayekî fermî dest pê kiribû. Piştî 15'ê Tîrmeha 2016'an de li Tirkiye hewldana darbeya leşkerî pêş ket di navbera Tirkiye û YE re rageşî pêş ketibû. Krîza di navbera YE û Tirkiyeyê de hêj berdewam dike.



## Li Gever û Bedlîsê 9 leşker hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li Geverê 8 leşkerên Tirk hatine kuştin. Li gorî daxuyaniya HPG'ê, li Bedlîsê jî leşkerek hate kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de roja 25'ê Hezîranê saet 19:45'an li dijî yekîneyeke artêşa Tirk a li ser girê Şehîd Hozan ê li navçeya Gever a Colemêrgê çalakiyek hatiye kirin. Li gorî daxuyaniyê, ji 2 baskan ve derbên xurt li çeperên leşkeran hatin xistin û di encamê de 8 leşker hatin kuştin, 4 jî birîndar bûn.



Navenda Ragihandinê diyar kir ku di çalakiyê ya li Bedlîsê de jî leşkerekî dijmin hate kuştin, 2 jî birîndar bûn."


## Li Îranê çalakiyên bazirganan dewam dikin



Çalakiyên bazirganên Îranê li Tehranê û gelek bajaran tevî hemû astengiyan dewam dikin.

Tê gotin ku gelek kes hatine destgîrkirin. Bazirganên Tehranê, ji bo şermezarkirina ne arambûna rewşa gumrukê û astengkirina malên wan, roja Yekşemê daketin qadan û dest bi çalakiyan kirin.
Li gorî agahiyan, ji ber meş û xwepêşandanên li Tehranê, xeta dudiyan a metroyê hatiye girtin. Her wiha hate ragihandin ku hêzên rejîma Îranê bi gazên îsotê û fîşekên plastîk dest li çalakiyan werdane û gelek çalakger destgîr kirine.
Di çalakiyên bazirganan de dirûşmên li dijî rejîma cimhûrî ya Îranê û Serokomarê Îranê dirûşm tên dîtin.
Çalakiyên bazirganan li gelek bajarên mezin belav bûne. Li gorî agahiyan, li Ehwaz, Kirmanşah, Meşhed, Erak, Urmiye û Tebrîzê jî bazirgan daketine qadan.

## Balafiran bombe li gundên Amediyê barandin



Artêşa Tirk a dagirker êrîşên xwe yên hewayî yên li Başûrê Kurdistanê dewam dike. Duh jî bombe li gundên Amediyê barandin.
Balafirên şer ên Tirk duh saet 11'an bombe li gundên navçeya Amediye ya Duhokê barandin.
Li gorî agahiyên ji herêmê hatin girtin, bomberdûman li gundên Gulka û Bazê yên Amediyê hatine kirin. Ji ber bombebaranê zerar li dehl û rezên gundiyan bû.



# Dengê Hesen Zîrek hê jî zindî ye

***Hunermendê Kurd yê bi nav û deng Hesen Zîrek di 46'emîn salvegera wefata xwe de tê bibîranîn. Hunermend Hesen Zîrek yek ji hunermendên nav û deng yên gelê Kurd e. Tevî ku 46 sal li ser wefata wî re derbas bûn, lê dengê wî yê xweş hîn jî di guh û mejiyê gelê Kurd de ye.***

Hunermendê navdar Hesen Zîrek, di 46'emîn salvegera koça xwe ya dawî de, hîn jî di mejî û dilê gelê Kurd cihê xwe diparêz e, zindî ye.
Hunermendê navdar Hesen Zîrek ku di 26'ê Hezîrana sala 1972'yan de jiyana xwe ji dest da, tê bibîranîn. Di ser koça dawî ya hunermend Zîrek re 46 sal derbas bûn, lê dengê wî yê xweş hîn jî di guh û mejiyê gelê Kurd de ye.
Hunermend Hesen Zîrek yek ji hunermendên nav û deng yên gelê Kurd e. Di 29'ê Mijdara sala 1912'an li gundê Hermêle yê girêdayî bajarê Bokan ê Rojhilatê Kurdistanê jidayîk bûye.
Hunermendê nemir Hesen Zîrek ku li dû xwe gelek stran ji bo pêşxistina huner û muzîka kurdî hiştine ev bû 46 sal ku koça xwe ya dawîn kiriye Zîrek heta dawiya emrê xwe ji bo muzîka kurdî xebitiye
Her di ciwaniya xwe de wekî stranbêjekî dest bi gotina stranan kiriye, lê belê ji ber mirina bavê xwe mecbûr dimîne ku bar û piştiyê malbata xwe ango debara malbata xwe bide sermilên xwe û dev ji stranbêjiyê berdide.
Ji bo kar û xebatê li gelek bajar û navçeyên Kurdistanê digere ku li ku derê mabe di demek kin de nav û dengê wî belav bûye. Her çend nêrîn û dîtinên cuda li ser jiyana wî hene jî mirov dikare bi vî awayî kurteyekê ji jiyana wî pêşkeş bike; Hesen Zîrek di 12 saliya xwe de ji Bokanê derdikeve û diçe bajarê Seqizê.
Di 15 saliya xwe de dîsa vedigere Bokanê, lê pir li wir namîne û ji bo karekî peyde bike diçe bajarên Tewrêz û Tehranê. Piştre jî diçe başûrê Kurdistanê û li bajarê Silêmaniyê li taxa Dergezên bi cih û war dibe. Her wiha demekê jî dibe mêvanê Kerkûkê û di dawiyê de di sala 1953'yan de diçe Radyoya Bexdayê ya Kurdî û bi dehan stranên kevnar ên kurdî ligel Orkestraya Radyoya Bexdayê qeyd dike.
Di 14'ê tebaxa 1959'an de li ser daxwaza Radyoya Kurdî ya Tehranê vedigere Îranê û ligel orkestrayên cur bi cur li Tehranê kar û xebatên muzîka kurdî dike.



Her wiha carinan li Radyoya Tewrêzê li Azerbeycanê stran gotine. Dûre di sala 1960'î de diçe Kirmaşanê û piraniya karên xwe yên hunerî ligel Orkestraya Radyoya Kirmaşanê bi rêberiya hunermendê mezin ê kurd Mucteba Mîrzade qeyd dike ku nav û dengê hunera Hesen Zîrek zêdetir belav dibe, lewre ew stranên ku li wir kom kirine wekî şakarên hunera wî têne zanîn.
Hesen Zîrek piraniya stranên xwe bi zaravayê kurmanciya jêrîn ango soranî gotine, lê carinan bi zaravayên din ên zimanê kurdî jî gotine. Her wiha bi zimanê farisî û tirkî jî stran gotine û heta radeyekê zimanê erebî jî zanibûye.
Hesen Zîrek 24'ê hezîrana 1972'yan (Di hin çavkaniyan de weke 26'ê di hinan de jî weke 28'ê hezîranê derbas dibe) de di 51 saliya xwe da li bajarê Bokanê xatir ji meriv û dilxwazên xwe dixwaze û diçe ser dilovaniya xwe. Ew li dû xwe arşîveke hunerî ji bo neteweya xwe û cîhanê dihêle ku bûye çavkaniyeke dewlemend bo hunera xwerû û resen a kurdî. Hesen Zîrek yek ji stranbêjê herî xebatkar ê kurdan e ku bi sedan stran li radyo û televîzyonan xistine bin qeydê. Niha piraniya berhemên wî di arşîvên enstîtuyên kurdî û yên ereb û farisan de de hatine parastin. Em ji wan enstîtuyan bi hêvîne ku di demên pêş de ew wekî rêzealbumên Hesen Zîrek bên amadekirin. Di albûma wî ya yekem a bi navê Ser Kanî de komek ji stranên wî yên ku dema li Radyoya Bexdayê û li Radyoya Tehran û Kirmaşanê hatine komkirin cih digirin. Gelek stranên Zîrek jî yên wekî 'Ey Niştiman' û 'Yela Şofêr' ji aliyê 'hunermendên tirk' ve hatine dizîn û 'Ey Niştiman' wekî 'Ankaranin Taşina Bak' û 'Yela Şofêr' jî wekî 'Yallah Şofor' hatine wergerandin…

## Morêka Êşê





Idrîs HENAN

Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê bi destekdayîna her du Rêveberiyên Şehba û Efrîn û bi sponseriya lojistîk a Ajansa Rûmaf li Kantona Şehbayê projeya Moreka Êşê dest pê kir. Zarokên Efrînê yên ku bûne mexdûrê zilm û dagirkeriyê, bi vê projeyê wê nameya xwe bigihînin zarokên cîhanê û rastiya hov a dagirkeriya Tirk raberî dunyayê bikin.
Nûrî Ednan Rêveberê Ajansa Rûmaf li Kantona Şehbayê derbarê vê projeyê "Depoya Hunerî" de dibêje: Piştî ku dewleta Tirk Kantona Efrînê dagir kir, gel berê xwe da Kantona Şehbayê. Di vê pêvajoya dagirkeriyê de gelek destdirêjî li ser gelê me yê li Efrînê maye çêbû. Em jî weke rojnamevan xwedî erka ragihandina rastiyê ne.

### GELÊ EFRÎNÊ GELEKÎ QEHREMAN E

Ednan dewam dike: Dunya hemû dizane ku şervanên gelê Efrînê xwedî rola sereke di têkbirina çeteyên DAIŞ de ne. Ji ber vê gelê Efrînê gelekî gewre û qehreman e. Weke ragihandina Şehbayê me xwest perelelî roja hilbijartinan li Tirkiyê, bi destê zarokên Efrînê rastiya faşîzma li Tirkiyê bi cîhana azad re parve bikin.
Ednan dibêje: Çirûska projeyê ji hizirîna hevalên Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê ye. Bi sponseriya me û alîkariya herdu Rêveberiyên Şehba û Efrînê ev proje pêk tê. Armanac ew e ku zarokên Efrînê bi tiliyên xwe êşa dagirkeriyê û rûyê bi rûmet a Berxwedana Serdemê li ser xaseke spî bihunin û nîgar bikin.

### ZAROK DANGÊ XWE XÊZ DIKIN


Derbarê qonxên projeyê de Ednan ev tişt anî ziman: Weke destpêk zarokên kampa Berxwedan bûn. Piştre jî wê zarokên kampa Serdem mohra xwe li vê "entîkeya hunerî" bixin. Piştî wê em ê li hemû deverên Şehbayê ku zarokên Efrînê lê dimînin bigerin. Ew jî dê dengê xwe li ser vê xasê nîgar bikin. Piştî ku ev proje bidawî bibe em ê hewl bidin ku ev resma bi destê zarokên Efrînê hatiye nîgarkirin li hemû pêşengehên dunyayê bê pêşandan.
Dawiyê de Nûrî Ednan ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Bi riya vê projeya hunerî em hevî dikin dengê zarokên Efrînê bi tiliyên wan bigihêje hemû cîhana azad û demokrat. Bila cîhan asta tede û destdirêjiya dagirkeriya Tirk li ser gel û zarokên Efrînê nas bike ka hovîtiyeke çawa li ser Efrînê hatiye pêşxistin.

### GULÊN ME HER ZINDÎ NE

Yek ji nîgargiran zaroka bi navê Viyan Hemdî ya ji gundê Mîrkan bû. Viyan dibêje ku hîna ew gula di hewşa wan de ji bîr nekiriye. Bi kedekî mezin xwedî kiriye. Ji ber vê jî wê gulê diresimîne. Viyan dewam dike û dibêje: Gelek bîranînên min bi gulan re hene. Ez ji gulan hez dikim. Lê dijminê hov gulên me jî pelçiqandin. Ji bo ku gula min her zindî bimîne li ser vê xasê nîgar dikin. Viyan dawiyê de hêviyên xwe bi van gotinan dibêje: Hêviya min ew e ku rojekê berê vegerim Efrînê û gula xwe ji nû ve zindî bikin.
Hêjayî gotinê ye ku hemû zarokên kampa Berxwedan ên tevlî vê projeya hunerî bûne bîranîn, çiya, pez, mal, deşt, newal û qonaxên berxwedaniya ku şahîdiya wê kirine li ser vê xasa bi qasî dilên wan spî, hunandin û bi îradeyeke mezin xwestin name û rastiya çors a dagirkeriya Tirk bigihînin zarokên cîhanê.

## Koçberî li pêş hunerê astengî nîne

Mihemed Hesen ku di bin germa havînê û di konên koçberan de taployan çê dike diyar kir ku derfet jê re peyda bibe wê pêşengehekê li dar bixe û tê de tabloyên xwe pêşkêş bike.
Şêwekarê koçber yê bi navê Mihemed El-Hesen ku di kampa Eyn Îsa de bi cih bûye diyar dike ku wî di nexşekirina tabloyê de rengên hêviyê bi kar anîne û wiha dibêje: "Ez li vir im û hê jî li ber xwe didim."
Di kampa Eyn Îsa ya koçberan de welatiyên ji seranserî herêmên Sûriyê hatine bicihkirin. Di nava van koçberan de gelek kesên afirîner jî hene. Ev afirînerî jî di bin konê koçberiyê de di nava êş û azaran de hatine veşartin. Di bin koneke koçberiyê de şêwekar Mihemed Hesen tabloyên xwe nexşe dike.



Şêwekar Mihemed El-Hesen ji welatiyên bajarê Reqayê ye û 46 salî ye. Mihemed El-Hesen beriya ku çeteyên DAIŞ'ê Reqayê dagir bikin xebatên xwe yên şêwekarî û muzîkê dida meşandin. Piştî dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê ew neçar ma dest ji şêwekariya xwe berde. Çeteyên DAIŞ'ê dema ku bi ser mala Mihemed El-Hesen de girtin, hemû tabloyên wî û mala wî jî şewitandin. Mihemed El-Hesen ji ber hovîtiya çeteyan neçar ma koçberî herêma Eyn Îsa bibe û di kampê de bi cih bibe. Di kampê de careke din dest bi xebatên xwe yên şêwekariyê kir û nexwest dest ji xewn û hêviyên xwe berde. El-Hesen niha di tabloyên xwe de serpêhatiya herêmê bi rengên hêviyê vedibêje. Her wiha rewşa koçberên di kampê de jî di tabloyên xwe de nexşe dike.
Şêwekar Mihemed El-Hesen di tabloyên xwe yên rengîn de diyar dike ku tevî hemû serpêhatiyên xwe hê jî li ber xwe dide.
Mihemed El-Hesen girêdayî mijarê wiha got: "Ez aramiya xwe di şêwekariyê de dibînim, ez hemû dema xwe di nexşekirina tabloyan de diqedînim. Ez di her tabloyeke xwe de peyamekê ji derdora xwe re dişînim."El Hesen li ser rewşa xwe jî wiha dibêje: "Li vir di kampa koçberiyê de êş û zordarî kom dibin. Koçber li ser alîkariyên rêxistinan dijîn. Lê hêviya me ya vegera bajarê me piştî ku hate rizgarkirin mezin bûye."El-Hesen behsa daxwazên xwe kir û got: "Xewn û daxwazên min hene û tu kes nikare têk bişkîne." El-Hesen da zanîn ku hêviya wî ya vegerê gelekî mezin e û diyar kir ku eger derfet jê re peyda bibe dê pêşangehekê li dar bixe û tê de tabloyên xwe pêşkêş bike.
El-Hesen di dema niha de nikare vegere bajarê xwe ji ber ku çeteyên DAIŞ'ê giştî mala wî şewitandine û lêçûnên sererastkirina malê bi wî re tune ye. Mihemed El-Hesen dîsa jî hêviyên wî mezin in da ku vegere bajarê xwe û jiyana xwe ji nû ve geş bike.Şêwekar Mihemed El-Hesen yek ji kesên afirîner di kampê de ye. Li rex şêwekariya xwe her wiha helbestan jî dinivîse…***ANHA***

# Em ê Efrînê ji dagirkeran rizgar bikin

***Piştî ku Konferansa Rizgarkirina Efrînê hat lidarxistin û seferberiya giştî hat ragihandin, delegeyên konferansê li ser encamên konferansê civînan ji gelê Efrînê yê li Şehbayê re lidardixin. Di civînan de encam û biryarên konferansê tên nirxandin. Welatiyên Efrînê jî diyar kirin ku ew amade ne tevlî serferberiyê bibin û Efrînê rizgar bikin.***



Civînên ku delegeyên Konferansa Rizgarkirina Efrînê ji gel re lidar dixin didomin û gelê Efrînê di civînan de anîn ziman ku ew ê ji bo rizgarkirina Efrînê têbikoşin.
Li navçeya Ehrez, Fafîn, Til-Qerah, Ehdas û Kefer Naya yên kantona Şehba civîn ji aliyê delegeyên Konferansa Rizgarkirina Efrînê ve hatin lidarxistin û bi sedan şêniyên kantona Efrînê ku li Şehba dimînin, tevlî civînan bûn.
Di civînê de encamnameya Konferansa Rizgarkirina Efrînê hat xwendin. Her wiha delegeyan mijarên di konferansê de nirxandin û bi gel re parve kirin. Di veguheztina encama konferansê ji gel re Rêveberiyan anîn ziman ku wan di konferansê de xebatên xwe yên Efrînê nirxandine û rexnedayîna xwe dane.
Di civînan de delegeyan balkişandin ser berxwedaniya 58 rojan a Efrînê û anîn ziman ku divê gelên Sûriyê û bi taybet gelê Efrînê ji bo rizgarkirina Efrînê têkevin seferberiyê û xwe li ser wî bingehî birêxistin bikin.
Her wiha di civînan de hat ziman ku gelê Efrînê li kantona Şehba li ber xwe dide, xwe birêxistin kir û niha xwe li gorî şert û mercên şer perwerde dike, xebatên xwe yên dîplomasî hîn xurtir kirine û dixebitin ku Efrîn ji dagirkeriya Tirkiyê rizgar bikin.
Gelê Efrînê jî di van civînan de anîn ziman ku ruhê Berxwedaniya Serdemê her diçe geştir dibe û ew amade ne ku tevlî serferberiyê bibin û Efrînê ji dagirkeriya Tirkiyê rizgar bikin…*ANHA*

## Hejmara şagirtên peymangehê zêdetir dibe




Li Reqayê peymangeh 15`ê îlonê 2017`an vebû, her diçe hejmara şagirtan zêdetir dibe û heyanî niha 5 dewreyên perwerde vebûne.
Peymangeha Reqa dewreya 5`emîn a Şehîd Îmad Mehawiş vekir û 31 şagirt ji Reqa û gundewarên wê tevlî dewreya perwerdê bûn. Perwerde wê 40 roj berdewam bike û dê waneyên îdeolojîk û pîşeyî weke raghandin û fêrbûyîna leptop werin dayîn.
Ji Rêveberiya Peymangehê Hisên El-Ebîd li ser mijarê axivî û got:" Şagirt baş tevlî perwerde dibin û daxwaza wan a pêşketinê heye".
Şagirtê Peymangehê Ehmed Kedûr jî got: "Destpêkê ez di biryara xwe ya tevlîbûna dewreya perwerdê de ne zelal bûm lê belê ez niha bang li hemû ciwanan dikim ku werin peymangehê xwe qeyd bikin. Piştî çend salan em ji dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê rizgar bûn û em niha bi rehetî têne perwerde kirin".
Şagirtê bi navê Ehmed Ebîd jî got: "Di civaka me de tu mafên jinê tinebûn lê belê ew jî niha tevlî perwerdê dibin û em hatine peymangehê da ku xwe pêşbixînin û civakeke zanist ava bikin".
Şehîd Îmad Mehawiş ji herêma Kesrat a dikeve başûrê Reqa yê ye. Şehîd Îmad yek ji şagirtên vê peymangehê bû û dema xebatên ciwanan li Reqa û gundewarên wê dida meşandin şehîd bû…*ANHA*

## Ji bo sala nûamadekariyên perwerdê tên kirin



MSD'ê ji bo nirxandina xebatên Buroyên perwedê civînek li dar xist.
Civîn li navenda MSD'ê ya navçeya Eyn Îsa ya Kantona Girê Spî hat li darxistin.
Hevserokên Buroya Perwerdê ya MSD'ê Receb El-Mişref, Nesrîn Doko û Hevserokên buroyên Reqa, Tebqa, Minbic û Dêrazorê tevlî civînê bûn.
Di civînê de raporên buroyan yên mehane hatin nirxandin û beşdarvanên civînê ji bo sala perwerde ya nû pêşniyarên xwe kirin.
Hevseroka Buroya Perwerdê ya MSD'ê Nesrîn Doko derbarê civînê de wiha got: "Me sala par dibistan bi awayekî awarte û bê amadekarî vekirin. Lê îsal emê pêşniyarên civînê bigirin û ji bo peydekirina meteryalan û hemû pêdiviyên dibistanan wê bixebitin".
Hêjayî gotinê ye ku hemû komîteyên perwerdê, mamosteyan di perwerdeya havînê re derbas dikin…*ANHA*

## Şaredariya Kobanê rêyên bajêr qîr dike



Şaredariya Gel a Kobanê li gorî plansaziya ku di meha Gulanê de danîbû, hezar û 356 metre rêyên bajêr qîr kirin.
Şaredariyê dest bi qîrkirina rêyên taxa Botan a rojhilat kir. Tê zanîn ku ji ber lehiyên ku li Kobanê çêbûne, piraniya malên taxa Botan di bin avê de mabûn û rêyên taxê xirab bûn. Şaredarî dê hemû rêyên taxa Botan qîr bike.
Girêdayî mijarê şêwirmendê hevserokê Meclisa Şaredariyê ya Kantona Kobanê Salih Kurdî wiha got: "Hemû xebatên qîrkirinê di nav taxên bajêr de dewam dikin û heta niha rêyên derveyî Kobanê hatine qîrkirin."
Kurdî diyar kir ku ji bo xebatên qîrkirinê du werşe erkdar kirine; werşeya hilkirina qîrê û werşeya qîrkirinê.

## Bi 27 şagirtan dewreyeke nû dest pê kir



Akademiya Şehîd Xalid Ilêwî di çarçoveya çalakiyên Akademiyên Civaka Demokratîk ên li tevahiya Bakurê Sûriyê de, dewreya 5'an a amadekariya xebatkar û rêveberên herêma Tebqayê vekir.
Akademiya Şehîd Xalid Ilêwî bi navê Dewreya Şehîd Ebdullah El-Mixlac bi beşdariya 27 endaman dewreyek da destpêkirin.
Dewre bi merasîmekê hate vekirin. Ibrehîm El-Mixlac, birayê Şehîd Ebulah El-Mixlac ku dewre bi navê wî hate vekirin, axivî û bal kişand ser têkoşîna birayê xwe ya di nav Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê de. Di berdewama merasîmê de endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Hesen Mihemed Elî axivî û rewşa siyasî û leşkerî ya herêmê nirxand. Mihemed her wiha bal kişand ser girîngiya rola meclisan di birêxistinkirina civakê de.
Piştî axaftinan dewreyê bi awayekî fermî dest pê kir. Dewre wê meheke dewam bike… *ANHA*

## EWROJ..



### Şêx Seîd

Farûk SAKIK

Li Amedê, salona sinemayê ji bo dadgehê hatibû amadekirin. Li salonê kamerayekî sînemayê û ronahiyên mezin hatibûn bicîhkirin. Mehkeme ji serî ve dihat qeydkirin.
Li bajêr jî tedbîrên ewlekariyê hatibûn girtin. Hemû rê û kolanên girîng ji alî leşkeran ve hatibû girtin. Ketina gundiyan ya bajêr hatibû qedexekirin. Şêx Seîd û serekên din di hucreyan de bûn. Têkiliya wan bi hewre an jî bi malbatê wan re hatibû qutkirin. Ji bilî endamên dadgehê kesî nikaribû bi wan re têkilî danîya. Hikumetê telîmat dabû mehkemê, ku derfet nedin parastina siyasî. Li ser vê yekê dozger û endamên mehkemê ketibûn nav hewldanên qayilkirin, yanê xapandina serhildêran. Dozger, ji Şêx Seîd re digot, ji bo girîngiya jiyana wî divê ew dûrî parastina siyasî bisekine û sozê namûsê daye Şêx Seîd, ku ew parastina siyasî neke wê cezayê îdamê negre. Dozger Ehmed Sureya di bîranînên xwe de wiha dibêje: Min ji wan re digot, ji bo ku hûn piştî darezandinê bi selametî bizivrin malên xwe, parastina siyasî nekin. 'Endamên dadgehê hemû serekên serhildanê qayil kiribûn ku di rûniştinên mahkemê de armanca serhildanê tenê bi motîvên olî û paşveanîna rejima padişahiya Osmanî ve girêbidin.Serekên serhildanê jî bi soz û bextên dadgehê bawerkiribûn û di parastina xwe ya li hember mahkemê de, behsa motivên netewî nekiribûn. Bi vî awayî pirsgirêka Kurdistanê hatibû veşartin. Lê, Şêx Seîd di îfadeyên xwe yên Wartoyê de ku piştî girtinê dabû de armanca serhildanê wek 'herî kêm Kurdistanekî otonom' diyarkiribû.Di pêvajoya darezandinê de endamên dadgehê li hember serekên serhildanê bihurmet bûn. Bi peyvên wek 'birêz' xîtabê wan dikirin. Ew kibariya wan heta roja îlankirina biryaran domkiribû. Bi vî awayî hemû tawanbaran di gotinên xwe yên dawîn de, daxwaza beraata xwe kiribûn. Di 28ê Hezîranê de rûniştina dawîn çêbû. Dozger bi carekî ve helwesta xwe guhertibû. Di îdeanama dozger Ehmed Sureya de, naveroka serhildênê wek, 'di bin perdeya olî de tevgera cudaxwazî' hatibû tarîfkirin. Di îfadeyên kesên wek Binbaşı Qasım Beg de jî, armanca serhildanê wek 'dazwaza damezrandina dewleteke Kurdî' dihat binavkirin. Ehmed Sureya yê ku sozê beraatê dabû serekên serhildanê, maskeya rûyê xwe avetibû û bi peyvên sar, ji serokê dadgehê kuştina Şêx Seîd û hevalên wî duxwest. Biryara dadgeha Tirk jî ji alî serokê mahkemê Mazhar Mufît ve hatibû xwendin: 'Heryek ji we ji ber sedemekî rêberî kir, lê armanca we hemûyan serbixwebûna Kurdistanê bû.' Û navê 47 kesên ku wê bihatana dardekirin hat xwendin.

EWROJ....

Di sehera Amedê de 47 rêwiyên mirinê li pey hev berê xwe dabûn sêpêyan. Dengê zincîr, pranga û selewatan tevlîhev bûbû. Feqî Hesen li peşiya hemûyan bû. Salih Begê Hênî ku ber bi mirinê ve dimeşiya, bang li hevalên xwe dikir: 'Roj roja mêrxasa ye. Bila dostên me bi meşa me serbilind, dijminê me biqehir bin.' Li meydana Deriyê Çiyê 47 sêpê li kêleka hev hatibû rêzkirin. Berbanga roja 29ê Hazîranê bû. Asîman vekirî bû, tîna germ ya rojê li ser Amedê belavbûbû. 47 cesedên serekê Kurd li kêlaka hev li sêpêyan daleqandî bû. Gotinên dawîn yên Şêx Seîd wiha bû: 'Ez hatim dawiya jiyana xwe ya vê cîhanê. Ez ne poşmanım ku ji bo netewa xwe dibim qurban. Bes ku torinên me, li hember dijmên rûyê me reş nekin.' Bejna zirav û dirêj ya Şêx Seîd li bin siya kela Amedê ketibû xewa ebediyetê.

ÎROJ....

Piştî ku Şêx Seîd û hevalên wî hatin dardekirin, cenazê wan li cîhê ku hatin daleqandin veşartibûn. Ji bo ku qebrên serekên Kurdan nebin ziyaretgeh, li ser zemîna qebristanê bargeheke leşkerî hat avakirin. Şêx Seîd û hevalên wî li taxa Derê Çiyê, li nêzi baxçê Ordûevi ya îro razayîne. Kurd di vê serhildanê de biserneketibûn lê tov û rihê vê berxwedanê hetanî roja me dewamkir. Torinên Şêx Seîd li hember dijmin rûyê wî reş nekirin. Li Agirî û li Dersîm serîhildan û herî dawî jî di bin pêşengiya PKK'ê de serhildana wan a Kurdistanek azad dewam dike.



# Kongreya Star hêviya jinan e

***Kongreya Star ji bo perwerdekirin û çareserkirina pirsgirêkên jinan xwedî roleke girîng e. Jinên Bakurê Sûriyê Kongreya Star ji bo xwe weke hêviyekê dibînin. Jinên Taxa Şêxmeqsûd a Helebê diyar kirin ku jinên xwe bi rêxistin kirine dikarin hemû pirsgirêkên xwe çareser bikin.***







Piştî ku Kongreya Star di 19'ê Îlona 2015'an de li taxa Şêxmeqsûd a bajarê Helebê hate damezirandin, gelek pirsgirêkên jinan çareser kirin. Her wiha gelek pirsgirêkên girêdayî civakê li gorî berjewendiya jinan çareser kirin. Keda endamên Kongreya Star û Navenda Weqfa Jinan berhemdar bû. Gelo Kongreya Star pirsgirêkên civak û jinan çawa çareser kirin?
Di encama rewşên şer li bajarê Helebê û ji ber kevneşopiya paşverûtî ya civakê ku li ser jinan hatibû ferzkirin, jinên taxa Şêxmeqsûd di rewşeke dijwar re derbas bûn. Kongreya Star karibû ji jinan re bibe palpişt û gelek pirsgirêkên wan ên civakî çareser kirin û piştgiriya pêşxistina hişmendiya jinan kir da ku karibin nakokî û pirsgirêkên xwe çareser bikin.
Welatiya bi navê Henîfe Elî (30) piştî ku hevserê wê mir bi her sê zarokên xwe re rastî pirsgirêkên civakî hat. Lê Henîfe di serdana xwe ya navenda Kongreya Star de çirûskeke hêviyê li pêşiya xwe dît.
Henîfe Elî got: "Piştî ku hevserê min mir, ji ber danûstandinên malbata min û malbata hevserê min, min demeke dijwar bi zarokên xwe re derbas kir. Her du aliyan ji min xwest ku ez careke din bizewicim, lê helwesta min cuda bû, min xwest ez bi zarokên xwe re bimînin."
Henîfe Elî gelek caran bê çare dima û di encamê de berê xwe da navenda Kongreya Star û şêwira wan ji bo pirsgirêka xwe xwest. Endamên kongreyê jî xwest alîkariya wê di çareserkirina pirsgirêka wê de bikin û xaniyek ji Henîfe û zarokên wê re peyda kirin. Her wiha bi armanca ku bi rola xwe di civaka xwe de rabe di Komîna Şehîd Şîlan Kobanê de hate erkdarkirin.
Henîfe got ku bi alîkariya endamên Kongreya Star hêviyên wê mezintir bûn û rê li pêşiya şerpezebûna malbata xwe girt. Henîfe niha debara malbata xwe dike û her sê zarokên xwe xwedî dike.
Welatiya bi navê Ebîr Mehmîko ya 27 salî dayika zarokekê ye, piştî ku bav û hevserê wê mirin hêviyên wê di jiyanê de lawaz bûn û rastî gelek pirsgirêkên darayî hat. Ebîr diyar kir ku ew gelek caran neçar maye cilên xwe bifiroşe da ku pêdiviyên zarokên xwe peyda bike.
Ebîr ji bo pirsgirêka xwe çareser bike serdana Mala Jinan a taxa Şêxmeqsûd kir û beşdarî gelek perwerdeyên pêşxistina hişmendiyê bû. Piştî van perwerdeyan Ebîr diyar kir ku êdî ew dikare pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bike û cihê xwe di rêveberiya Navenda Weqfa Jinan de girt.
Ebîr Mehmîko destnîşan kir ku jinên xwe bi rêxistin kirine dikarin hemû pirsgirêkên xwe çareser bikin û danûstandina rewşên dijwar bikin.

**Çareserkirina pirsgirêkan girêdayî pêşxistina hişmendiyê û birêxistinbûnê ye**

Endama Rêveberiya Navenda Weqfa Jinan a taxa Şêxmeqsûd Pêrîşan Reşîd diyar kir ku nêrîna civakê li hemberî jinan tenê di hebûna wê ya li rex mêran sînordar e. Ev rewş bi awayekî berfireh di civakê de belav bûye û bandoreke neyînî li jiyana jinan kiriye.
Pêrîşan da zanîn ku bê perwerde mayîna jinan û lawazbûna aboriya wê ya xweser sedema sereke ya pirsgirêkên wê di civakê de ye. Ji ber vê yekê divê aboriya xweser a jinan were pêşxistin û Kongreya Star bi armanca çareserkirina vê pirsgirêkê gelek proje pêşkêşî jinan kirin.
Pêrîşan di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Çareserkirina pirsgirêkan girêdayî pêşxistina hişmendiya jinan û birêxistinkirina wan e. Ji ber vê yekê em ê hewl bidin alîkariya jinan di hemû aliyan de bikin."…*ANHA*

## Hemû herêm wê ji çeteyan bê rizgarkirin



Lîlwa Ebdullah diyar kir ku şervanên QSD`ê hemû gundewarên bajarê Hesekê ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar kirin.
Lîlwa destnîşan kir ku şervanên QSD`ê bi hevkariya artêşa Iraqê wê hemû herêmê ji çeteyan rizgar bikin.
Derbarê Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê de Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdullah axivî û diyar kir ku Pêngav bi hemû leza xwe didome.
Lîlwa Ebdullah destnîşan kir ku şervanên QSD`ê piştî ku ji nûve dest bi hemleyê kirin, gelek navendên stratejîk û bajarokê El-Deşîşa ku navenda sereke ya çeteyan a li ser sînorê di navbera Sûriye û Iraqê de bû, rizgar kirin.
Di berdewama axaftina xwe de Ebdullah da zanîn ku rizgarkirina bajarokê El-Deşîşa tê wateya ku hemû gundewarên başûr û başûrê rojhilatê bajarê Hesekê ji çeteyan hatiye rizgarkirin. Her wiha rêya girêdana di navbera çeteyên DAIŞ`ê ya li Sûriye û Iraqê de bi temamî hate qutkirin.
Di çarçoveya hevkariya di navbera artêşa Iraqê û şervanên QSD`ê de Lîlwa Ebdullah destnîşan kir ku hevkariya wan didome heta ku hemû herêm bi temamî ji çeteyên DAIŞ`ê were rizgarkirin û ewlehiya li ser sînorê Sûriye-Iraqê were avakirin.
Lîlwa Ebdullah diyar kir ku hêzên rêjîmê gelek caran êrîşî nuqteyên ku ji çeteyan hatin rizgarkirin kir da ku pêşketinên şervanan asteng bikin lê ew yek bi bin ket. Ebdullah di berdewama axaftina xwe de diyar ku şervanên QSD`ê bi sedan sivîl ji herêmên di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê de rizgar kirin û piştî ku herêm ji mayinan were paqijkirin, wê rê bidin ku sivîl vegerin malên xwe.
Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdullah diyar kir ku şervanên YPJ`ê roleke pir xurt di hemleya Bagera Cizîrê de lîst û bi sedan jinên Ereb ji zilm û zora çeteyan rizgar kirin."…*ANHA*

## Li ser xeta Zîlan em ê jinan azad bikin



Li gundê Borik yê girêdayi Şengalê ji bo bîranîna şehadeta Şehîd Zîlan , ji aliyê Tevgera Azadiya Jinên Êzidî TAJÊ ve civînek hat lidarxistin. Di civînê de sînevîzyon hat temaşekirin û li ser navê TAJÊ axaftin hatin kirin.
Li dijî êrîşên li ser Gelê kurd, Şehîd Zîlan ya bi nasnav Zeynep Kinaci di 30'ê Hezîrana 1996'an de çalakiyek fedaî pêk anî û jiyana xwe ji dest da. Ji bo bîranîna Şehadeta Zeynep Kinacî li gundê Borik civînek hat li darxistin.
Di civînê de li ser navê Tevgera Azadiya Jinên Ezidî TAJÊ Şînda Şengal axaftin kir.
Şînda Şengal di destpêka axaftina xwe de wiha got: " Zîlan bi çalakiya xwe ya fedaî bû sembola azadiyê. Bi cesaretake mezin bi vîneke xurt li dijî hêzên komploger çalakiyek fedaî pêk anî. Zîlan bi vê çalakiya xwe hêvî da hemû gelên bindest ku li dijî dagirkariyê rabin ser piyan. Çalakiya Zîlanê derbeyak mezin li dijî dagirkeriya Tirk bû. Zîlan bi vê çalakiya xwe peyam da hemû neyarên gelê kurd, yên ku êrîşî îradeya me ya azad û bîr û baweriyê me bike. Şehîd Zîlan, kesyata Rêber Apo îredeya gel didît. Yê ku bi rastî bixweze li ser axa xwe bi vîn û îredeya xwe azad bijî pêwîst e xeta Zîlan ji xwe re mînak bigre."
Şînda Şengal bal kişand ser îradeya gelan bi taybatî jî ya jinan û wiha got, "Îradeya gelê me fikir û ramanê Rêber Apo ye. Bi rastî ji pêwîst e em di xeta Zîlanan de xwedî li Rêberê xwe derkevin. Serokê me îradeya me ye. Bi fikra Rêber Apo em dikarin azad li ser axa xwe bijîn. Ya ku Gelê Kurd civaka Êzidî bi cîhanê da naskirin fikra Rêbertî bu. Em jî weke gelên Êzidî ger ku bi rastî em dixwazin li ser bîr û baweriya xwe azad bijîn pêwîst e em xwe di her milî de bi rêxstin bikin. Bi taybatî jî jinên Êzidî pêwîst e li ser xeta Zîlanê bibin xwedî îrade."
Şînda Şengal gotina xwe weha bi dawî kir; "Çawa Şehîd Zîlan ji bo me bû sembola azadiyê, em ê jî di vê riyê de berdewam bikin û tevahiya jinan azad bikin."… *JINNEWS*

## Heyeta jinên Rojava li Başûr hevdîtinan dike



Şandeya Kongreya Star di çarçoveya Pêngava "Jinên cîhanê ji bo Efrînê serî hildin" serdana sazî û buroyên jinan ên Başûrê Kurdistanê dike.
Şandeya Kongreya Star ji endama Komîteya Perwerdê Rîhan Qalo, endama Komîteya Têkiliyên Doplomasî ya Kongreya Star a Kantona Efrînê Fatima Lekto û endama Buroya Jin a PYD'ê Zehra Aldar pêk dihat li Silêmanî bi parlamanterên herêma Kurdistanê, endamên Tevgera Jinên Azad a Kurdistanê û nûnera Tevgera Azadî a Kurdistanê di nav de parlamantera tevgerê Yisra Receb re hevdîtin pêk anîn.
Di nîqaşan de, behsa girîngiya destwerdana rêxistinên jinan, hiqûqî û siyasî ji bo rawestandina binpêkirinên derheqê jinan bi taybetî jinên Efrînê hate kirin.
Şandeyê her wiha bi nûnerê Yekîtiya Jinên Kurdistanê re civiya. Li vir jî rewşa jin li Rojava, bi taybet, rewşa jinên li Efrînê ku rastî ne heqiyê ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve tên û rewşa jinên li Şehbayê û zehmetiyên ku dikişînin hatin nîqaşkirin.

## Hozan Canê hate girtin



Hozan Canê ku welatiya Elmanyayê ye û ji ber xebatên hilbijartinê ya HDP'ê çûbû bajarê Tirkiyê Edîrneyê, ji aliyê polîsên dewleta Tirk ve bi bahaneya filmê wê ya li ser fermana 74'an a Şengalê destpêkê hate binçavkirin paşê bi biryara dadgehê hate girtin.

Bêtehemûliya dewleta Tirk a li hember Kurdan xwe di her qadê de dide nîşan. Welatiya Almanyayê hunermend Hozan Canê, ku ji bo xebatên hilbijartinê yên HDP'ê çûbû Edîrneyê, li navçeya Enezê hatibû binçavkirin. Piştî îfadeya li dozgeriyê Canê bi daxwaza girtinê sewqî Dadgeriya Ceza ya Sulhê ya 1'emîn a Edîrneyê hatibû kirin. Dadgehê bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" Canê girt.
Ji bo îdiaya navborî wekî hincet fîlmê "Fermana Şengalê ya 74'an" ku Canê hem derhênerê wê hem jî lîstikvana wê ya sereke bû û di sahneyek fîlm de çek di dest de bû, di çenteyê wê de hatiye dîtin hat nîşandan.
Hozan Canê şandin Girtîgeha Edîrneyê.

# Heta azadiyê wê têkoşîn bidome

***Çalakiya li bajarê Fransa Strasbourgê ya ji bo azadiya rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dike. Parlementerê berê yê HDP'ê Ertûgrûl Kurkçu, parlementerê YNK'ê Salar Mehmûd, parlementerê Goran Şêrko Emîn***




Çalakiya destekê ya nûnerên saziyên Kurdan ên li Ewropayê yên ji bo çalakiya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan didome.
Pêkhateyên KCDK-E, Yekitiya Sûryaniyên Ewropayê (ESU), Partiya Sosyalîst a ji nû ve Damazirînê (SKYP), YNK û Tevgera Goran destek da çalakiyê.
Roja sêyan a çalakiyê parlamenterê berê yê HDP'ê Ertugrul Kurkçu û beşdarên meşa ji Ocalan re azadî, hatin qada Nobeta Ji Ocalan re azadî. Ji parlamentoya Başûrê Kurdistanê, wekîlê YNK'ê Salar Mehmûd û wekîlê Goran Şêrko Emîn jî li çalakiyê amade bûn.
Hevserokê Kongra-Gel Remzî Kartal li ser çalakiyê axivî, bi bîr xist ku çalakiya ji bo azadiya Ocalan ev 6 sal in didime, diyar kir kul il çar parçeyên Kurdistanê Kurd bi hişmendiya ku wê bê Ocalan jiyan nebe azadiya Ocalan dixwazin û got niha, bi vê çarçoweyê nûnerên saziyên Kurd çalakiyê dikin.
Hevserokê KCDK-E'yê Yuksel Koç bi daxuyaniyekê malavayî li Ertugrul Kurkçu, paralmenterên Başûrî kir û got Kurd azadiya Ocalan dixwazin, heta ku Ocalan azad bibe ev çalakî wê bidome.
Koç diyar kir Ocalan azadiya gelê Kurd, gelên Rojhilata Navîn û hemû baweriyan e.
Dostekî Kurdan ku di çalakiyê de amade bû, bal kişande ser projeya civaka demokratîk a Ocalan û giringiya çalakiya li ber Konseya Ewropayê destnîşan kir. Çalakvanê Elman bang li hemû gelan kir ku tevlî çalakiya ji bo azadiya Ocalan bibin û bi dirûşma, ''Bê Ocalan jiyan nabe'' axaftina xwe qedand.

## Vegerî Efrînê lê poşman bû



Şêniyên Efrînê yên koçî Tirkiyê kirine, ji aliyê dezgehên çapemeniyê û artêşa tirk ve tên xapandin. Tê gotin ku Efrîn arame lê belê piştî welatî vedigerin rastî girtin û îşkenceyan tên.
Welatiyê bi navê Fayîk Îbrahîm ji navçeya Cindirêsê ye. Ragihandin û çapemeniya tirkan ew xapand û hişt ku piştî 5 salan vegere Efrînê û serdana xizmên xwe bike. Lê ew ji aliyê dagirkeran ve hate girtin û rastî îşkenceyan hat.
Îbrahîm mîna hemû welatiyên ku li wê derê kar bikin berê xwe da Tirkiyê. Demeke dirêj li Tirkiyê xebitî. Ji ber şer, pevçûn û girtinên ku li ser sînorê Efrînê û bakurê Kurdistanê çêdibûn nikaribû vegere Efrînê.
Piştî ku artêşa tirk a dagirker di 18`ê Adarê de Efrîn dagir kir, dezgehên çapemeiya tirkan dest bi derewan kir û got ku Efrîn ewle ye û rewşa wê aram e. Gelek şêniyên Efrînê bi vê yekê hatin xapandin. Berê xwe dan Efrînê û ji aliyê artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê ve hatin revandin û êşkence li wan hatin kirin.
Îbrahîm çîroka xwe ya 15 rojan vegot û diyar kir ku ji Tirkiyê berê xwe da deriyê Bab El-Selam yê li herêma Ezazê û ev tişt anî ziman: "Dema ku ez gihiştim Efrînê çeteyan çenteyên min ji min girtin. Tenê cilê min tê de bûn. Ez çûm mala yek ji xizmên xwe. Du roj paşde ez ji aliyê çeteyan ve hatim revandin. Ez 4 rojan di girtîgehê de mam. Min nizanîbû ez li ku derê me. Gelek girtiyên din ên kurd di girtîgehê de hebûn. Em dihatin îşkencekirin."
Îbrahîm destnîşan kir ku piştî lêkolînan çeteyan hezar û 200 dolar jê xwest da ku wî serbest berdin û wiha dewam kir: "Pereyê ku jin min dixwestin min da çeteyan. Bi hincetên şaş sivîlan digirin da ku li beranberî girtina wan pereyan jê bistînin."
Piştî ku Îbrahîm pere da çeteyan, nikarîbû bigihîje cihê jidayikbûna xwe li navçeya Cindirêsê ya ku 20 km dûrî navenda bajarê Efrînê ye. Îbrahîm ev tişt got: "Efrîn bûye cihê metirsiyê. Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê pereyan ji xwediyên dikanan distînin. Her wiha zeviyên cotkaran talan dikin."
Îbrahîm da zanîn ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê bi cureyên cuda tevliheviyê di navbera Kurd û Ereban de derdixin û wiha got: "Rojekê min berê xwe da firinê da ku ez nan bikirim. Piştî ku nanpêj nas kir ku ez kurd im, ji min re got ku biçe sûkê nan bigire û nan neda min."
Fayîk destnîşan kir ku ew nikaribû li Efrînê razaba û diyar kir ku heger tu bixwaze razê pêwîst e kesek parastina te bike, ji ber ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê bê sedem digirin ser malên welatiyan, her wiha bi şev gule bê ser û ber tên avêtin da ku metirsiyê di nava şêniyan de çêkin."
Îbrahîm piştî ku ji aliyê çeteyan ve hate îşkencekirin, biryar da ku ji Efrînê derkeve û wiha got: "Ji bo ku ez ji Efrînê derkevim min 800 dolar dan çeteyan. Ez li gundê Kîmarê yê girêdayî navçeya Şêrawa hiştim. Paşê ez meşiyam û gihaştim gundekî din ê navçeya Şêrawa."
Îbrahîm niha li navçeya Fafîn a girêdayî kantona Şehbayê dimîne û bang li hemû şêniyên derveyî Efrînê kir ku li Efrînê venegerin ji ber ku rewşa wê ne baş e û wekî ku dagirkerên Tirkiyê di ragihandina xwe de dibêjin ewlehî û aramî lê tune ye…*ANHA*

## Ji bo Yekîtiya Neteweyî deriyên nû vebû




Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier diyar kir ku di hilbijartina 24'ê Hezîranê de îtîfaqa di navbera kurdan de pêk hatiye û ji bo Yekîtiya Neteweyî ya Kurd pêk were deriyek nû vebûye.
Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier ku ji nû ve bû parlamenterê HDP'ê encama hilbijartinê û pêkhatina Yekîtiya Neteweyî ya Kurd nirxand. Taşçier da zanîn ku li gorî encamên hilbijartinê AKP'ê di astek micid de dengê wê ketine û got: "Mirov dikare bêje ku AKP têk çûye. Di bin siya OHAL'ê de hilbijartin pêk hat. Hevalên me xebata hilbijartinê birêve dibirin hatin binçavkirin û girtin. Di bin siya faşîzmê û qeyûmên li ser şaredariyan de em çûn hilbijartinê. Tevî ewqas hemû şertên zehmet xebata HDP'ê birêve bir bi hêz bû."

**DERIYÊ NÛ VEBÛ**

Taşçier destnîşan kir ku her çiqas di navbera partiyên kurd de îtîfaq pêk nehatibe jî di navbera kurdan de îtîfaq pêk hatiye û wiha dewam kir: "Ev yek jî xwe di encamên hilbijartinê de dide nîşandan. Yekîtiya netewî bi partiyan sînor nîne. Yekîtî girêdayî hevgirtina gel e. Heke yekîtiya neteweyî ya kurd pêk were, dê gavên ber bi azadiyê ve bên avêtin. Em bi hemû dînamîkên civakê re hatin gel hev û me xebat birêve bir. Ev 40 sal e siyaseta kurd di navbera xwe de parçe bûye û nayê cem hev. Lê îro ji bo Yekîtiya Neteweyî ya Kurd pêk were, deriyên nû vebûn. Divê ji îro pê ve em gavên xûrt biavêjin."
Taşçier diyar kir ku piştevaniya partiyên kurd a ji bo HDP'ê di warê Yekîtiya Neteweyî ya Kurd de gavek pêşketî bû û wê HDP ji bo pêkanîna Yekîtiya Neteweyî ya Kurd xebatên xwe dewam bike.

## Armanc dagirkirina tevahiya Başûr e

Berpirsê Komîteya pêşmergeyên Dêrîn beşê girtiyên siyasî yê YNK'ê Mam Hejar diyar kir ku armanca dewleta Tirk dagirkirina tevahî Başûre û got; "Ji ber berjewendiyên hizbî kongreya netewî pêk nayê."
Berpirsê Komîteya pêşmergeyên Dêrîn beşê girtiyên siyasî yê YNK'ê Mam Hejar derbarê dagirkeriya dewleta Tirk û êrîşên li ser xaka Başûrê Kurdistanê da zanîn ku dewleta Tirk bi hincetên cûda êrîşê Başûrê Kurdistanê dike.
Mam Hejar daxuyakirin ku dewletên dagirkerên Kurdistanê naxwazin ti carê Kurd bigehin azadiya xwe û serbixwe bijîn.
Mam Hejar bal kişande ser bêtifaqiya aliyên Başûrê Kurdistanê li dijî dagirkeriyê û wiha dewam kir; "Her cara mijar dijbertiya Kurdan be, Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye dibin yek. Lê li hemberî dagirkeriyê Kurd nabin tifaq. Li Başûrê Kurdistanê dijî dagirkeriya heyî tifaqek nîne. Ji ber berjewendiyên hizbî yên li gel dagirkeran, rê nade em eniyek netewî ava bikin."Mam Hejar bal kişande ser giringiya lidar xistina kongreya netewî û got; "Ji ber berjewendiyên hizbî kongreya netewî nayê lidarxistin. Dewleta Tirk jî bi hinceta PKK'ê êrîşê Başûr dike. Gelo li Herîr, Rewanduz, Başîqa û Şengalê PKK heye? Na. Lê berjewendiyên hinek aliyên siyasî yên Başûrê Kurdistanê li gel dewleta Tirk rê dide vê. Hebûna 27 baregehên leşkerê Tirk li ser xaka Başûr, bi armanca dagirkeriyê ye."
Di dawiyê de Mam Hejar daxwaz ji parlamentoya Iraqê û Başûrê Kurdistanê kir ku daxwaza derketina baregehên leşkerên Tirk ji Başûr bikin û got; "Divê gelê Kurd ji bo bighije azadî û serxwebûna xwe, yekîtiya xwe çêbike."…*ROJNEWS*

## 10 hezar kesan daxwaza rakirina cezayê Ramîn kirin



10 hezar welatiyên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê bi nameyên îmzekirin daxwaz ji rêxistinên navnetewî yê mafê mirovan kirin ku hewl bidin cezayê darvekrinê ku li girtiyê siyasî yê Kurd Ramîn Hisên Penahî hatiye birin, bê rakirin.
Piştgiriyaji bo girtiyê siyasî yê Kurd Ramîn Hisên Penahî ku cezayê darvekirinê lê hatiye birin berdewame.
Di vê çarçoveyê de nameyek bi 10 hezar îmzeyan pêşkêşê rêxistinên navnetewî hate kirin.
Di nameya ku li ser çapemeniya Iraqê hatî belavkirin de, diyar dike ku di demek cezayê darvekirinê li Ramîn Hisên Penahî hatiye birin ku Ramîn ti ji sûcên li ser hatine kirin, qebûl nekirine.
Di nameyê de wiha hate gotin; "Parêzerê Ramîn cezayê jê re hatiye dayîn, cezayekî dûrê qanûnê binav dike. Ev cezay bi fermana Sopay Pasdaran û Wezareta Îtlaatê hatiye derxistin. Ji ber ku li gorî yasayên Îranê cezayê Ramîn Hisên Penahî ne ku darvekirin, heya cezayê girtîgehê jî jê nagire.
Em weke kesên ev nameye îmze kirine, cezayê darvekirina Ramîn Hisên Penahî weke siyasetek ji bo bêdengkirina gelê têkoşerê Îranê dibinin. Bi vê boneyê jî em daxwaza pêkanîna hiqûqê dikin û demek pêş a din cezayê darvekirinê were rakirin."



# Em ê li dijî dagirkeriyê bisekinin

***Dewleta Tirk a ku bi salan e di bin navê PKK'ê de êrîşî xaka Başûrê Kurdistanê dike. Heta niha di encama êrîşan de bi dehan welatiyên başûr şehîd bûne. Welatiyên başûr diyar kirin ku li dijî êrîşan ew ê cih û warê xwe neterikînin û bang li hêzên Kurd kirin ku li dijî êrîşên dagirkeriyê bibin yek."***






Gelê Başûrê Kurdistanê destnîşan dike ku armanca dewleta Tirk qirkirina Kurdan e û dibêje, "Berdêla xwe canê me jî be em ê cih û warê xwe biparêzin."

Dewleta Tirk a ku bi salan e di bin navê PKK'ê de êrîşî xaka Başûrê Kurdistanê dike. Heta niha di encama êrîşan de bi dehan welatiyên başûr şehîd bûne. Welatiyên başûr diyar kirin ku li dijî êrîşan ew ê cih û warê xwe neterikînin.

**SIVÎL TÊN KUŞTIN**

Rêbiwar Ehmed Birahîm: "Em bi hemû şêweyî li dijî êrîşên dewletên dagiker in. Ev der cih û warê me ne. Em ê bi ti şêweyî rê nedin dagirkeriyê. Ne cara yekê ye ku dewleta Tirk êrîşê dibe ser gundê me. Dixwazin gelê herêmê bitirsînin û ji warên wan bidin revandin. Qendîl ne cihekî ji rêzê ye û wê ti carî kesek nikaribe dagir bike."

**EM Ê TÊBIKOŞIN**

Dêhat Sedredîn: "Em jî weke şêniyên gundê Mawnayê helwesta dewleta Tirk a dagirker şermezar dikin û dibêjin, encax bi yekîtiyeke xurt em dikarin pêşî li armancên dagirkeran bigirin. Peyama me ji bo dezgehên mafên mirovan ew e ku faşîzma dewleta Tirkiyê bibînin û li dijî wê xwedî helwest bin. Çi jî dibe bila bibe em dest ji cih û warê xwe bernadin, em ê li dijî êrîşan têbikoşin."

**QENDÎL MALA ME YE**

Rêbûwar Emîn: "Ciwanên Qendîlê wê ti carî rê nedin dagirkeriyê. Qendîl mala me ye û em weke ciwanên Qendîlê amade ne mîna çavên xwe li Qendîlê binêrin. Eger di berdêla wê de em canê xwe jî bidin em amade ne biparêzin. Eger dewleta Tirk bixwaze Qendîlê dagir bike em ê bersiva pêwîst bidinê."

**DIVÊ HELWEST YEK BE**

Feysel Xelatê: "Ev polîtîkaya dewleta Tirk ne nû ye, her tim bi gotin û êrîşan gefa dagirkirina Qendîlê dixwin. Ev gef ji bo ku gel cih û warê xwe biterikîne, tên xwarin. Dewleta Tirk tim derewan dike. Divê li dijî dagirkeriyê helwesta hemû aliyên siyasî yek be."

## Kurd ji bo Azadiya Ocalan li ser piyan in




Çalakiya li Strasboûrgê ya ''Ji Abdullah Ocalan re azadî'' kete sala 7'an. Zilma dewleta Tirk a li ser Ocalan û li ser Kurdan li Strasboûrgê bi dîplomasiya gel bi cîhanê hate naskirin.
Yek ji navê ji Insîyatîva 'Ji Ocalan re azadî' Reîmar Heîder, ku ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kampanyayên navnetewî organîze kirî û li cîhanê ji bo naskirina felsefeya Ocalan xwedî rol e li ser çalakiya nobetê ya ku ketî sala 7'an axivî. Heîder diyar kir Kurd tim bi daxwaza azadiya Ocalan li ser piyan in û got, ''Em Insîyatîva ji Ocalan re azadî, wateyeke mezin didine çalakiya rûniştinê ya demdirêj. Ya ku çalakiya li Strasboûrgê dike taybet ew e ku li hemû şertên hewayê û zextê jî dewam dike, di rengekî rûniştî, ji gel, çand û pîşeyên cuda kes tevlî nav vê çalakiyê dibin."
Heîder bal kişande ser izolasyonê û got, ''Tekan girêdana wê ya bi Ocalan re ew e ku saziyên girêdayî Konseya Ewropayê ne''. Heîder wiha dewam kir: ''Ji bo ku giringiya Ocalan a ji bo Kurdan û Rojhilata Navîn bidin fêhmkirin çalakiya li Strasboûrgê pir girîng e. Ev çalakî bi wê peywirê radibe ku berpirsyarî û peywira Konseya Ewropayê û CPT'yê bi bîra wan dixe.''
Heîder got li gel zexta raya giştî jî saziyên li Strasborûgê peywira xwe bi cih naynin û got, ''Dev ji reaksiyoneke ji bo azadiya Ocalan berdin, ne girêdayî wan peymanan in ku îmzeya wan li ser heye jî. Li gel ku rêxistina pêşîlêgir a êşkenceyê ne jî, çavê xwe ji izolasyona, tecrîd û şertên giran ê girtîgehê yê Birêz Ocalan re digirin. Mixabin ne ku tenê saziyên li Strasboûrgê wiha dikin, Rêxistina Efûyê, Rêxistina Çavdêr a Mafê Mirovan jî wiha tevdigerin."

**PIRTÛKÊN OCALAN BI 14 ZIMAN IN**

Heîder her wiha li ser pirtûkê Ocalan diyar kir ku ew girîngiyeke mezin didine, wergerên pirtûkên Ocalan ên bi 14 zimanan organîze dikin, danasîna wan dikin. Heîder got, "ji bo pirtûkan gelek seminer û civîn kirine û ev ê bidome jî."
Reîmar Heîder bal kişande ser salvegera 20'an a komployê û sala 70'yî ya rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û diyar kir ku bi vê çarçoweyê ew ê li Hambûrgê cara çaran konferansa Modernîteya Demokratîk çêbikin.

## Parlementoya dagirkeriya Tirk nagire rojeva xwe




Serokê Koma Azadî (Hizba Şûî) li parlementoya Başûrê Kurdistanê diyar kir ku Desteya Serokatiya Parlementoya Herêma Kurdistanê naxwaze rûniştineke taybet li ser dagirkeriya Tirkiye ya li Kurdistanê pêk bîne û got tevî ku wan îmze kom kiriye jî parlemento kom nabe.
Artêşa Tirk ji ber nebûna helwesteke pratîkî ya cidî ya partiyên Başûrê Kurdistanê û Iraqê roj bi roj xaka Iraq û Başûrê Kurdistanê dagir dike. Têgotin ku heya niha zêdeyî 30 kîlometre sînorên Iraqê binpêkiriye. Her wiha gelek parlementerên Kurdistanê ji bo parlemento ji bo nirxandina dagirkeriya Tirk taybet kom bibe, gelek îmze kom kirine. Lê, heya niha tevî ku gelek welatiyên sivîl ji ber bomberduman û êrîşên Tirkiyê yên li ser xaka Başûr jiyana xwe ji dest dane û birîndar bûne jî lê, Hikûmeta Başûrê Kurdistanê ti helwesteke xwe ya fermî nebûye. Heya niha parlementoyê jî bersiva daxwazên welatiyan û îmzeyên ku hatine kom kirin jî ne daye.
Serokê Koma Azadî (Hizba Şûî) li parlementoya Başûrê Kurdistanê Ebû Karwan axivî û diyar kir ku zêdeyî 10 parlementeran îmze komkiriye ji bo parlemento bi rojeveke taybet a derbarê pirgirêka dagirkeriyê li Başûr de kom bibe û wiha pêde çû, "lê mixabin heya niha Desteya Serokatiya Parlementoyê bersiva vê daxwaza me ne daye û girîngî bi vê pirsgirêkê jî nade ku rojane liv û tevgera artêşa Tirk li herêmê heye.
Ebû Karwan her wiha dazanîn ku kengê 10 parlementer ji bo guftûgokirina pirsgirêkeke girîng daxwaza kombûnê ji parlementoyê bike, divê kom bibe û daxuyakirin ku desteya serokatiya parlementoyê naxwaze li ser pirgirêkeke wisa girîng kom bibe.
Ebû Karwan di dawiya axaftina xwede got ev ne cara yekê ye ku desteya serokatiya parlementoyê girîngî bi daxwaznameya parlementeran nade û got ku berê jî gelek caran gelek pirsgirêkên girîng hebûye desteya serokatiya parlementoyê girîngî pê nedaye…*ROJNEWS*

## Çalakiya 'Mertalên Zindî' didome



Çalakiya 'Mertalên Zindî' ya ciwanên Başûrî ya li Qendîlê ku li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk dest pê kir, 20 roj in dewam dike.
Şêniyên herêma Meredo ya Qendîlê duh çûn serdana çalakgerên Mertalên Zindî. Bi navê çalakgerên 'Mertalên Zindî' Wîlyen Berzencî di dema serdanê de axivî û diyar kir ji ber ku gef li destketiyên Kurdistanê tê xwarin ew niha li Qendîlê ne.
Berzencî destnîşan kir ku êrîşên li dijî Qendîlê li dijî tevahiya destketiyên Kurdistanê ye.
Wîlyen Berzencî bang li Kurdistaniyan kir ku ji Qendîlê heta Sine, ji Mahabadê heta Silêmanî û Hewlêrê, ji Serhedê heta Qamişloyê li cem gerîlayên azadiyê bin.

**ÊRÎŞ LI DIJÎ TEVAHIYA KURDISTANÊ YE**

Piştî Wîlyen Berzencî bi navê ciwan û şêniyên Meredo Soran Alî peyivî û işaret bi êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk kir. Soran Alî got, "Êrîşên li ser Qendîlê ne tenê li dijî Qendîlê ya jî PKK'ê ne. Êrîşên dagirkeriyê li dijî temamiya Kurdistanê ye. Weke gelê Başûr em ji vê derê ji dewleta Tirk re dibêjin; Çawa ku me dagirkeriya we ya aborî qebûl nekir û dest bi boykotê kir, em ê dagirkeriya we yal eşkerî jî ti carî qebûl nekin. Heta ku dagirkeriyê biqedînin, em ê bê navber têbikoşin."

## Tirkiye li Efrînê sûcê şer dike

Di rûniştina Mafê Mirovan de ya li NY'yê axaftin hate kirin û hate gotin, Tirkiye hiqûqa navnetewî binpê kiriye, li Efrînê sûcê şer û mirovahiyê kiriye.
Rûniştina Mafê Mirovan a 38'an a Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî (NY) di heftiya duyan de li ofîsa NY'yê ya Cinêvê didome. Di rûniştinê de Komîsyona Lêpirsînê ya Sûriyê ya Serbixwe bi mijara Gutaya Rojhilat rapora xwe da.
Tirkiye sûcê şer dike
Piştî ku Komîsyona Lêpirsînê ya Serbixwe ya Sûriyê rapora xwe da nûnerên dewletan û saziyên rêxistina sivîl li ser raporê şîroveyên xwe kirin.
Nûnerê Sûriyê li ser rapora Komîsyonê axivî, bersiv da sûcdariyên li ser rejîmê. Nûner her wiha got Tirkiye li Sûriyê sûcê şer dike. Nûnerê Sûriyê got Tirkiye hiqûqa navnetewî binpê kiriye, bi vî rengî ketiye nav xaka Sûriyê û wiha dewam kir: "Hûn liv ir dibêjin Sûriyê sûcê şer kiriye lê dagirkeriya Tirkiyê ya li Efrînê binpêkirina hiqûqa navnetewî ye. Tirkiye sûcê şer û sûcê dijî mirovahiyê dike. Ên ku li Efrînê dijiyan ne sivîl bûn?"

